Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - **YEKÎTÎ**

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hejmar (91) *Nîsan* *2010 z - 2622 k* *Buha (15))*

Hersal roja 22 ê Nîsanê …

Di pêvajo û rûdanên hişyarbûna netewî de , û di çerçewa veger û guhdana li hinde bûyer, serpêhatî û rojên dîrokî yên bi nirx û pirwate de , roja 22 ê Heyva Nîsanê li ba gelê Kurd weke cejneke rojnamevaniyê hatiye nasîn , û ji demekê ve hersal tête bîranîn . Ew roja ku li sala **1898** an li paytexta Misirê , bajarê **Qahîrê** , di çapxana dar-el-**Hîlal** de , yekemîn rojnameyeke bi zimanê dê di bin sernavê **Kurdistan** de hatibû weşandin û belav bûbû . Ango ev e **112** salin ku zana û rewşenbîrekî mîna **Miqdad Midhet Bedirxan** xwediyê wê rojnama dîrokî , destê xwe dabû ser birînê , û ji hîngê ve kul û derdên miletê xwe didane nasîn , dinivîsî û dibasî , dikir hawar û gazî , da Kurd bixwînin û zana bin , da ku, riya xwe nas bikin û jiyaneke bi rûmet bijîn .

Mirov dikare bibêje , ku ji hîngê ve û ta îro jî , ew doz û daxwaza rehmetî Miqdad Midhet li cî ye û her dê li cî be . Bi zimanekî dî ,mirov dikare bibêje : Tiştek ciyê xwendin û zanebûnê nagire , û nezanî mirovan û gelan bê hêvî û bê hêz dike , ji hev dixîne , qels dike , şaş û wenda dike …. Lewre , dijminê hovane û herî sereke nezanî bi xwe ye . Loma jî **cegerxwîn** gotiye : ***xwendin nebî kes naçe pêş , peyda dibin pir derd û êş … Ev dîn û dewlet xwendine , ev tac û şewket xwendine .***

Rehmetî **Nûredîn Zaza** jî têra xwe ev rêç ajotiye û hergav xwestiye ku em guh bidine xwendinê û bi taybetî D.R (11)

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

Cejina Rojn…….
Rêxisina Qamişlo ya P.Y.D K .S (YEKÎTÎ) **5**

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî
Dr. Kamîran Bêkes **6**

Roja 22î Nîsana…..
Mmê Alan **9**

17 ê Nîsanê ….
Rêberê Silîvî **12**